

**MARKISİSTÈN KURD
YEKBIN Û SEROKETIYA
TEVGERÈ TÈXIN
DESTÈN XWE !**

RÊYA RAST

*Dengê girêdana
markisistên Kurd*

**Jİ BO BICIHANINA
MAFÊ ÇARELËKIRINA
GELÊ KURD HEMÛ NIŞ.
TÎMANPERWERÊN PÊŞ.
VERÜ YEKBIN !**

Astixazî ji Mosko
Serxazî ji Washington

Kongra 26an ya partîya komuni-
sta Yekîtiya Sovyêti di roja
23.2.1981 li Mosko dest bi ci-
vînên xwe kir.

Rapora komîta nawendî bi fire-
hî li ser hemû besen jîyanâ
aborî, cîvâkî û sîyâsî li Y.S.
sekînî û plan bo pêşvebirna do-
za avakirna komunistîyê pêşne-
yarkirin.

Di warê sîyaseta dervayî de,
ya ko em dixazin bêtir bidin
pêş, kongra 26an bû kongra aş-
tixazî. Gelek pêşneyar bo sek-
nandina bicîhîrîna rakîtan (sa-
rûxan) li Ewropa-Rojava û bo
destberdan ji çêkirin û belav-
kirna bomba nêyutronî hatin
pêşkeşkirin.

Y.S. pêşneyarkir, ko berpirsi-
yarên sovyêti û yên amêrikî li
hev bicivin û li ser pêwendî-
yên herdû dewletan bidin û bis-
tinin. Hêñ jî pêşneyar hatin
kirin bo rawestandin û kêmkir-
na çekêن stratijî li gor peyma-
nên SALT I û SALT II

Dûmayîk rûpelê.... 2

Newroza 2593

Bi hatina newrozê gelê me şadibe,
agirêن pîrozkirnê vêdixe. Bihar
destpêdike û dest û çiyayêن Kurdi
stanê bi şînahî û çîçekan dixemi-
lin. Dar û ber bi hev re dikenin,
tarîyêن zivistanê bardikin, sar û
serma jibfrîdibin.

Sal bi sal bi şikestina zivistanê
û bi serketina biharê re welatper-
werên kurd zordestîya Dehak û ra-
perîna Kawa bi bîra xwe tînin û
ji xwe dipirsin, çîma ev welatê
xaş, ev welatê tev bax û bistan
wisa perçê perçê maye!!
Çîma ev gelê qehreman jî li her
çar perçênen welat bindest û peri-
şane!!

Lê çawa ji tarîyêن zivistanê roja
biharê hildikse, dunya gesdibe û
jîyan xasdibe, wisa jî hêviya ge-
lê kurd bi azadiyê, bi serketinê
serf hildide, xurtdibe.
Lewra jî newroz bûye nîşana têko-
şîna gelê me bo bicîhanîna mafê
çarenûsi netewî.

Di vê demê de êdî tevgera me ya
azadixaz gehîştîye tengekê dij-

Dûmayîk rûpelê.... 4

Kongra 26an ji encumena parastin (meclisa emin) ya Sazûmana Netewên Yekbûyî xast, ko berxwebide civinekê amadeke û ji berpirsiyarên dewletên endam bixaze di civinê de besdarbin û li ser pirsa aştî li cihanê dengkin.

Her wisa jî kongrê pêşneyarkir, komiteyeke navnetewî ji zana û pisporan (xebfran) were avakirin bo xetara şerê atomî ji cihanê re diyarke.

Ji alkiyeke dî ve kongrê bîrûbawerîya partîya komunista Y.S. li ser hemû bûyerên gîring li cihanê eşkerekir.

Bo şerê navbera ûraq û Iranê kongrê got, ev şereki ji herdû alîyan re bêkêre û tenê sûdêne impêryalistan pêktîne.

Kongrê xasteka Y.S. dûcarkir bo valakirna navçeya Xelîc ji hebûna çekdarîya bîyanî. Bo dîtina çarelêkirneke aştî ji pirsa Rojhilata-Navîn re kongrê konfîranseke fireh pêşneyarkir bo bigehe van encaman:

- 1- Kışandina leşkerê Israîlji hemû erdêna sala 1967 bi şer hatine standin.
- 2- Pêkanîna mafê çarelêkirna netewî ji gelê felestîni re, ta çêkirna dewleteke serbixwe.
- 3- Parastina serxwebûna hemû dewletên navça Rojhilata-Navîn.

Weke bo Ewropa, Amêrika û Rojhilata-Navîn wisa bo Rojhilata-Dûr jî xastekên hevîfyana aştî hatin pêşkeşkirin.

Ne tenê welatên sosyalist û partîyên komunist piştgirîya xas tekên aştîyê kirin, lê gelek hêz û mirovên aştixaz li welatên sermîyandarî jî ev xastekne rast dîtin.

Tenê hêzên impêryalist û nemaze li Dewletên Amêrikiyê Yekbûyî li sîna xastekên aştî xastekên şer bilinddikin.

Gerînendkarîya (îdara) Rêgin di hemû beşen jîyana civakî de pere kêmkirin, lê tenê bo leşker û çekkirnê pere bêtir pêşkeşkirin.

Ev jîmarên jêrîn bi zimanekî zelal dengdikin. Wezirê bergirî (diffa') Waynbêrger ji Kongrêx xast, xanedariya (maliya) weza reta bergirî ta sala 1982 bibe 222,2 milyar dolar yanê di vê salê de bi 32,6 milyar dolar were bilindkirin.

Ew dixazin hêza leşkerî xurtir bikin û hêna jî rola cendirmê cihanê bilîzin.

Beşek ji van peran bo çêkirin û bicihkirna rakêtan li Ewropa-Rojava têye dayîn. Bo rakêtên Pêrşîng II di sala 1981/82 de 551,7 milyon dolar û bo rakêtên Kruis-Missîf yêñ bixwe difirin 829,4 milyon dolar têñ dayîn. Bo balefirêñ casûsef AVAKS (AWACS) xanedariya salê ji 389 milyonan radibe 663 milyon dolar. Ji çêkirna rakêtên atomî MX re hukumet di sala 1981/82 de bêtirî 4,5 milyar dolar dixaze.

Heya sala 1986 dixazin xanedariya çekkirnê bigehe 368 milyar dolar.

Her wisa welatên fîmpêryalistên dî ji xanedariya çekkirnê bilinddikin. Parlementê britanî biryara çêkirna sistemeke çek-êñ atomî bi 5 milyar cinêh stêrlînf (pound) stand.

Li Almanya Fêdral dixazin xanedariya çekkirnê 2,3 milyar mark bilindtir bikin...

Bi lez û beza çekkirnê re fîmpêryalist propagandeyeke fireh belavdikin li dijî "xetera sovyêti" û gelên Ewropa û Amêrika çavtirsîdikin, da ew kanibin bi asanî planêñ xwe derbaskin, ko tenê di xizmeta monopolên mezin de ne.

Lê hêdfî hêdfî zehmetkêşen welatên fîmpêryalist derewên propaganda monopolan nasdikin û ji gotinbêjên wan bawernakin. Ew bi barê çekkirnê di jîyana rojane de dihesin û bihabûn û bê-karîyê li pêşîya xwe dibînin.

Îro aştî bûye xasteka mirovatîyê ya yekem. Bi vî awayî kongra 26an ya PKYS bi pêşneyar û xastekêñ bo aştî ne tenê den-gê Yekitiya Sovyêti bû, na ew dengê mirovatîyê giştî bû.

=====

Dûmayîka rûpelê....5

Mirovên marksist her pirseke civakî, ramani, qanûni, sîysi, exlaqî... wek encama pêwendîyêñ aborî û şerê çînayetî di civakê de dibînin. Lewra ew ji xwe dipirsin, ev çima waye? Û di xizmeta kê de ye?

Kedxuri û zordariya li ser jinan ji tenê di xizmeta axan, şexan û olperestan de ye. Em xebata jinan li cîhanê giştî bo wekhevî, dêmokratî û sosyalistîyê pîrozdzikin.

Her wisa em xebata jinêñ Kurdistan ji pîrczdiñin û hêvi-dikin di warê rêxistînî de zû pêşkeve.

=====

min nema kanin wê ji meydanê bidne alf. Dost û dijmin li tey gera me temasidikin û dinasin.

Hevalên me yên stratijî ji tevgera me ya nuh re şadibin û hê vîdikin, em rêya xwe bi mîranf û bê rawestan berdewamkin. Lê dijminên azadiya gelan, dijminên mirovatfyê ji tevgera me di tîrsin û gelek hesaban ji wê re dikin. Ew baş zanin, ev ne nola tevgera kevne, ko zû kanibin pê bileyzin.

Têkoşerên gelê kurd rêya xwe naskirne û hisyarin, nahêlin, ko burjiwazên tirk û ereb û faris destêr xwe dirêje tevgera me kin û rêya wê xarbikin.

Lê ji ber dijwarbûna doza gelê kurd ji welatparêzên kurd û nemaze ji marksist-lêññistan têye xastin, ko li gor berpir-sîyafîyên xwe yên dîrokî bin. Li hemberî zordestî û planêr dijminan û hêz û kanfrîn wan yên mezin, pêwîste em komên gel daxin meydana xebatê û rêxistinêr xwe xurtir bikin. Pêwîste marksist yekbin û hemû welatparêz milên xwe bidin milên hev.

Bi hisyarbûna gelêrî û rêxistina komên karker û cotkaran, bi yekbûna me emê kanibin newrozêr serbest û azad pîrozkin.

=====

8 ê adarê..roja jinan ya navnetewî

Sala 1910 li Kopinhagin di konfîransa navnetewî ya jinêr sosyalist de, li gor pêşneyara Klara Tsâtkîn sosyalista almanâ têkoşera navdar, biryar hate standin, ko roja 8 ê adarê bibe roja jinan ya navnetewî.

Di 8 ê adarê sala 1858 de bi hezaran jinêr karker li New York kar berdan û li dijî pêwendiyêr aborîyêr sermiyanf û bo wek-heviyya kira karê mîr û jinan derketin û xwepêşandanek çêkirin. Wan ev duruşma hildan: (Em nan û gulan dixazin)

Ey cara yeka bû, ko jin ji ber xwe û bê rêxistin û amadekirin bi hev re mafêr xwe bilindkirin. Carne din jî jinan li Amérîka bo mafêr xwe yên civakî kar berdan, lê nuh di sala 1909 de, dema 20 000 jinêr karker di kargeha dirûnê de kar berdan û bi hezaran jî hatin girtin, kanibûn çend mafan bistînin. Wek bilindkirna kira kar û kurtkirna zemanê kar.

Îro 8 ê adarê li cîhana sosyalist wek "roja hevgirtina navnetewî ya jinê hemû welatan di xebatê de bo aştî, pêkanîna wekhevî û pêşveçûna civakî" têye nasîn.

Li welatên sermîyandarî tenê hêzên sosyalist, dêmokrat û rê xistinê pêşverû 8 ê adarê wek roja navnetewî bo jinan pîroz dîkin.

Li gelek welatên dî ev roja bi navê roja dayîk têye nasîn.

Diyare, ko zor û setema li ser jinan ji çewsandin û zordarıya civakî giştî cudanabe. Civaka kevnar, civaka koletî û derebegî qeyd û bend dane pêşfîya jinan û di civaka burjiwazî de kêmdibin lê bi tevayî nayênil hilanîn.

Tenê di sosyalistî û komunîstîye de, weke hemû pîrsên civakê çare wê bi zanistî û li ser bingeha wekhevîya mirovan lêbibe.

Ev rastîya han bêguman rê li pêşfîya me nagre, ko em di her demê de û di sîya hemû pêwendîyêن civakî de xebatê bo rizgarîya jinan jî bikin.

Rizgarî û wekhevîya jinan bi mîran re ji hundirê mal de, ji zarokî de, ji hembêza dê û bavan de destpêdike. Hêne gelek dê û bav hene, ko lawan di ser keçan re digrin. Birayê biçük emr û fermanan li xûşka xwe ya mezin dide, ew jî serî li ber wî dadixe.

Pêwîste ronakbîr, kar û cotkarêni hişyar di jîyana rojane de vê wekhevîye bicihwînin.

Gereke xebat bête kirin bo belavbûna xwendinê di nav jinan de jî. Nabe jin di tarîya nezanîyê de bimînin. Pêwîste xwendegî têra keç û lawan werin vekirin. Naxwendin jî bête rakirin. Her wisa pêwîste kira karê jin û mîran weke hev be û rîya hemû karêni civakî li pêşfîya jinan jî vekirîbe.

Lê ji jinan jî têye xastin, ko mafêni xwe û rîya azadîya xwe bas binasin û bê deng nemînin. Pêwîste jin jî pîyêni xwe ve-male û bi birayê xwe re, bi bavê xwe re, bi lawê xwe re, bi heval û mîrê xwe re dakeve meydana xebatê bo hilanîna kedxurî giştî.

Pêwîste em gişt bi hev re bi zanîn û bi bêhneke dirêj li di jî rewşa ne mirovanî, li dijî kirîn û firotina jinan rawestin.

Têkoşîna gelê El Salvador nayê seknandin

Di sala 1980/81 de têkoşîna gelê El Salvador gavne şoresgerî mezin pêkanîn. Gava tewrifî mezin avakirna Enfyâ Rizgarîya El Salvadora Netewî bû, "Frîntê Parabundo Martî" (FMLN).

Parabundo Martî (1893-1932) bi çalakî di tevgera şoresgerî de besdarbû û bi roleke pêşengî rabû. Bû endamê partîya komunîsta El Salvador. Roja 1.2.1932 bi sûça rêberikir na raperîna gelêri wek pêşengetî komunîst bidarvekirin. Şoresgerên El Salvador Enfyâ Netewî bi navê F. Martî binavdikin, weke çawa şoresgerên Nîkaragwa tevgera xwe ya niştimanî bi navê Augusto Sêsar Sandino binavkirin.

Pêkanîneke din ewbû, ko peymaneke fireh navbera hêzên dêmokrat û şoresgerî bi navê Enfyâ Démokrata Şoresgerî (FDR) hate danîn.

Di hundirê welêt de junta fasifst bi tenê ma û li cihanê navê Enfyâ Farabundo Martî (FMLN) belavbû û berêzîya xwe (fîhtîrama xwe) bilindbû. Bi avakirna FMLN karêñ navçeyî hatin ser hev û leşkereke gelêriya şoresger peydabû. Hemû rêxistin û partîyên enfyâ netewî li ser bernama şer ji bûn yek û hêdfî hêdfî tevgera çekdarî ji karêñ biçûk û ji tektîka bergirî û xweparastinê kete bergeha birna êrisêñ fireh ser leşkerê junta.

Di roja 10.1.1981 de leşkera gelêriya şoresgerî, ya di bin fermana FMLN de ye, êrişa fireh destpêkir. Bi pêkanîna va êrişa tevayı çend armancêñ yekser pêkhatin, yên seroketiyya FMLN ji êrisê dixastin:

- 1- Bi pêkanîna van karêñ mezin pêwîste xurtbûn û kanînê hêzên dêmokrat û şoresgerî him li welat û him li dervay welat werin dîyarkirin.
- 2- Rola pêşbirî di warê leşkerî de ji dest dijmin bigrin.
- 3- Bi zora leşkerî junta jarbikin û mercan (şertan) peyda-kin bo hevkarî û lihevhatinê bi serleskerên welatparêz re, bi kinfsê re û bi burjiwaziya niştimanî re.
- 4- Birûbawerîya gel bi serketinê xurtbikin, dako xurtir di karêñ şoresgerî de besdarbibe.

Li gor gotinê berpirsiyarên FMLN, kî tevî çend şasbûnê propagandî ji aliyê hin hêzên eniya netewî, êrişâ fireh serketibû, tevgera çekdarî li welêt giştî belavbû, di wê lêt de mercêr raperinê navçeyî bastir bûn, wisa li der-vay welat jî mercêr piştgiriyê amadebûn.

Bi vî awayî li gor gotinê berpirsiyarên eniya netewî êdfî leşkerê junta nema kane giranîya xwe bide ser navçeyekê, bê ko hesabê êrisêñ partizanan li navçeyeke din bike. Partizan biryara cih û zemanê şer didin. Şoreşvan-êñ FMLN li gor tektîka şerê partizanî şerdikin.

Ji ber ko ew bê balefirin, ew tenê bo demeke kurt navçeyan distêñin û ji cihekî diçin cihekî din. Dema partizan dest ji cihekî yan navçeyekê berdidin, ew ne şikandineke leşkerîye. Ev tiştêñ wisa li gor dîtineke rastîbînî û li gor stratijiya şer têñ biryarkirin.

Dîsa li gor dîtina berpirsiyarên eniya nîştimanî şasbûn ew bû, kî di nav rêzên FDR de di bin bandora çend serketinan de gotina "êrişâ dawî" hate belavkirin, bê ko bi seroketiya FMLN re li ser vê gotinê hatibe dengkirin.

FDR şasbûneke din jî kir. Wê bangkir bo karberdanê dîsa, bê ko seroketiya FMLN ha jê hebe.

Karberdana tevayı 2 rojan dirêjkir û %50 ji aborîya El Salvador pûçkir.

Ev karberdana, tevî bandora wê ya bas, nikanîbû bibe tê-vedana raperîna gelêriya tevayı. Bi dîtina FMLN banga bo karberdanê pêwiste wek çeka dawî dakeve meydana têkoşînê, dema partizan û leşkera gelêri kanibin gel û karkeran li her derê biparêzin.

Lê di van 2 rojêñ karberdanê de leşkera junta bi giranîya xwe giştî li paytex bû û hêza partizanan li wir zor kîmîbû. Ji aliyekê din ve di van çend mehîn dawî de gelek pêşengêñ tevgera karkerî hatin girtin û kuştin.

Li gor pîvana FMLN ji banga karberdanê re, ew di wê demê de şasbûneke siyasibû.

Di dema dawî de hêzên şoreşgerî û demokrat berxwe-idin, eniya netewî hîn firehtir bikin û xwe amadekin bo sazkar na hukumeteke demokrata şoreşgerî, kî nemû hêzên nîştimanî perwer têde besdarbin.

FMLN/FDR peymanek bi serleskerên niştimanperwer re danîn bo avakirna "leşkereke nuh". Ev peymana di rcja 4.2.1981 de pêkhat. Bernameyeke ji 10 xalan erk û mafê "leşkera nuh" nişandide. Leşkera nuh pêşengîya FFLN dinase û di bin ferma na wê de ye.

Hêzên şoresger li El Salvador xwe amadedikin bo şerekî demdirêj, ji ber ko şerê gelê El Salvador û hemû gelên Amérîka Latinî ne tenê li dijî rêjimên leşkerî faşiste, lê ew yekser li hemberî împêryalistiya amérîkiye.

Hukumeta amérîki û nemaze gerînendkarîya (îdara) Rêgin bi hemû şeweyên dijşoreşî destê xwe dirêje tevgera rizgarîya El Salvador dike. Carekê 66 milyon dolar û careke di 35 milyon dolar arîkarîya leşkerî pêşkesî junta noker kir. Gelek serlesker û pisporê şerên partizanî şandin bo arîkarîya junta. 10 balefirên mezin (Hêrkulês) di dema şerê germ de roj bi roj çek, bombe û zexîre derbasî El Salvador dikirin. Di ber arîkarîya çekdarî re hukumeta amérîki propagandaka fireh li dijî komunîstî, Kuba, Nikaragwa... belavkir, ko arîkarîyê didin partizanên El Salvador. Propaganda împêryalistî dîsa ala "xetera komunîstî" bilindkir.

Hêd dûvkêñ împêryalistiyê jî destê xwe dirêje junta faşist dîkin û arîkarîya leşkerî jê re dişînin, İsrail, Vênezwêla, Honduras, Guatêmala...

Di destpêka şibatê de berpirsiyarekî FFLN got: (Em nabînin, ko êrişen leşkerî û danûstandinên siyasi li dijî hevin. Em amadene bo danûstandin, lê bi hukumeta amérîki re û ne bi junta re).

Ev gotina rewşa rêjimên diktatorî-faşist li Amérîka-Latinî hemûyan diyardike, ko tenê bûne parêzkarên sûdêñ împêryalistiya amérîki û hefsarê wan jî di dest saziyên împêryalistî de ne.

Şoresga gelê El Salvador qulpeke tezeye di zincîra şoresgen gelan de. Ev zincîra wê dirêjbibe ta hilwesandina sazûma-na împêryalistî û hilanîna çewsandin û kedxurîyê.

Şoresgen gelan nayêñ Küstün.. şoresga gelê El Salvador wê bi-serkeve û pêşvebiçê.

Ji dfroka tevgera komünîstî.

(Dûmayîk ji hejmara..13)

Banga kongra Cinêf belavbû û bû propagandaka mezin ji Navnetewîyê re. Biryarêñ wê, ko Marks bingeh jê re danîbûn, ketin bernameyêñ hemû partiyêñ karkerî.

Kongra dudîyan li Lozan di 2.-8.9.1867 de û ya sisîyan li Bruksêl di 6.-13.9.1868 de civîyan.

Di herdû kongran de Marks besdarnebû. Ew hên xerîki deranîna besê yekê ji pirtûka Sermîyan bû. Di kongra Bruksêl de bîyar hate standin, ko ji karkeran re were pêşneyarkirin, pirtûka Sermîyan bixûnin. Kongrê giranbihaya vê pirtûkê û karê Marks xiste ber çavan.

Di herdû kongran de bêtir li ser rewşa çîna karker, bandora makînan, pirsa karberdan û li ser maldariya taybetî (hebûna şexsi) hate dengkirin. Ji ber neyekbûna bîrûbawerî di Navnetewîyê de, biryarêñ kongra Bruksêl rengekî lihevhatinê nîşandidin. Lê bîrûbawerîya sosyalistî biserket.

Lêbelê biryara netewîkirna çareyêñ berkirnê di şêweyê dawî de li kongra Bazil sala 1869 hate wergirtin.

Di van kongran de pirseke mezin hatîbû pêşîya Navnetewîyê:
Çawa mirov kane li dijî ser raweste?

Piştî şerê Prûsyâ û Nemsâ sala 1866 û serketina Prûsyâ rewşa sfîyasî li Ewropa wisa bûbû, ko şer wê di demeke nêzik de navbera Prûsyâ û Fransa destpêbike.

Hêñ di sala 1867 de pêwendîyêñ herdû welatan berve tûjbûnê çûn. Di dema kongra Bruksêl de her mîrovekî bawerdikir, ko eger Prûsyâ ya Fransa amadekirna xwe temambike, agirê şer wê biteqe.

Navnetewî hêdi bûbû hêzeke xurt û komel û rêxistinêñ xwe li pir welatêñ Ewropa belavbûbûn. Wê baş dizanî, şereki wi sa wê derbeke mezin bigehîne karkerêñ herdû welatan, lewra bi firehî li ser vê pirsê rawestî. Di nav danûstandinêñ dûr û dirêj de dû bîrûbawerî peydabûn. Hinekan gotin, eger şer çêbû, pêwîste karberdaneke giştî were çêkirin, yêñ din gotin, tenê sosyalistî wê kanibe dawiya şer wine. Bi vê ye kê biryareke ne zelal hate standin. Di cihekî din de emê bi firehî li ser bîrûbawerîya Marks û Engîlz bisekinin.

Di rojêñ 5. û 6.9.1869 de li Bazil kongra çaran civîya. Ji ber ke imkaniya destpêkirna şer tenakê kêmübû, kongrê bêtir gira-niya xwe da ser dozêñ aborî û civakî.

Di vê kongrê de neyarêñ maldariya taybetî serketineke tevayî pêkanîn. Weke me li pêş jî got, di vê kongrê de biryara dawî bo netewikirna çareyêñ berkîrnê hate standin.

Di kongra Bazil de Bakunîn jî besdarbû. Bakunîn kiye, ci kar-kir, ramanêñ xwe ci bûn... Em bi kurtî nîşandidin.

Mixaîl Alêksandroviç Bakunîn (1814-1876) miroveki rûs bû li dijî qeyseriya rûsyâ xebatkir û bandoreke mezin li tevgera şoresgerî, nemaze li ronakbiran kir. Barkir Ewropa-Rojava û li Berlinê ew jî weke Marks Û Engilz di xwendegheha felsefî re derbasbû, ya bi navê filosofê almani mezin Hêgil dihatte nasin.

Di destpêka şoresê 1848/49 de ew li yalê almanên, ko dixastin bi çekdari ji Fransa têkevin Almanya, bû. Di dema şoresê da wî li Bohimîya berxwedida, şoresgeren slavî bike yek. Paşê li Drêsdin teví şoresê bû. Di rêya vejerê de ji Drêsdin Bakunîn hate girtin, û biryara bidarvekirnê dû caran jê re derket, ca-rekê li Almanya û carekê li Nemsâ. Herdû caran jî ew biryara daxistin zîndankirna herdemî (ebedî). Pîstî demekê ew dan dest qeyseriya rûsfî, ko çend sal zîndana gelek dijwar der-baskir. Sala 1857 Bakunîn avêtin Sibiriya. Sala 1861 ji wir bazda çû Japanê û di Amêrika re vejerî Ewropa.

Li London Alêksander Hêrtsin¹⁾ bi Bakunîn re got, ko Marks ew di rojnameyêñ Britanya de wek casûşê hukumeta rûsfî nîşandaye. Lî dema wî û Marks hevdû ditin, Marks jê re diyarkir, ko ne tenê ev ne karê wî ye, lî hêñ piştgirîya Bakunîn kiriye.

Marks jê re pirsa avakirna Navnetewiyê diyarkir. Ew bi van nûçeyan gelek şabû û szc da, bibe endamê Navnetewiyê.

Bakunîn ji London çû İtalya bê li wir bimîne. Wî weke sala 1846 dîsa bawerdikir, ko Marks rcleke gelek mezin daye çîna karker. Bakunîn xwendekar, ronakbir û nûnerên dêmokratiya

=====
1- Alêksander Ivanoviç Hêrtsin (1812-1870) şoresgerekî rûsfî dêmokrat bû, nîvîskar û filosofekî matêryalist bû. Dema şikan dina raperîna Dêkabirîstan sala 1825 bi hevaleki re sondxar, ke heya xasîn şerê qeyseriyê bikin û tola (heyfa) Dêkabirîstan bistêniñ. Ew li ser sonda xwe man. Li London Hêrtsin "Polyarna ya Zvêzda-Stêrka Bâkur" Û "Kolokol-Zengil" ti rûsfî derdanîn.

burjiwazi nijadekfî şoresger dinasîn û rola mezin dida wan û prolêtarîya şerpeze.

Bakunîn tevlî Navnetewiyê nebû û destpêkir ji xwe re rêxisti neke serbixwe avake. Ji İtalya çû Swîsra û tevî Komela Aştfî û Azadiyê bû û di komîta nawendî de hate hilbijartin. Sala 1868 ji Komela Aştfî û Azadiyê dêrket û dfîsa tevlî Navnetewiyê nebû. Bi hevalne xwe re "Komela Sosyal-Dêmokratiya Navnetewî" avakir.

Va komela nuh xwe bi gotinan gelek şoresger pêşkeşkir, şerekî giran bire ser xudê û dewletê. Lê bernameya wê ya aborî ne gelek zelal bû. Bêtir li ser hilanîna bermaye (miras) sekinî. Li şûna hilanîna çînên civakî bernama wê wekheviya çînan xast.

Komela Sosyal-Dêmokratiya Navnetewî ji komîta giştî ya Navnetewiyê xast bibe endam, lê bi mercê, ko rîbaz û bernama xwe ji xwe re bihêle.

Bakunîn nameyek di roja 22.12.1868 de ji Marks re şand. Dema ev nama gihîste Marks komîta giştî, ko Marks endamê wê bû, biryara qebûlnekirna endametiya Komela Sosyal-Dêmokratiya Navnetewî standibû.

Di wê namê de Bakunîn şasbûnên xwe û rastîya xêza Marks dinase. Wî nîvisandîye: (... Welatê min niha Navnetewiye, ko tu bi jîrbûn di avakirna wê de besdarbû. Êdî, hevalê delal, tu dibînî, ez niha sagirtê te me û ez bi wê yekê serfirazim...)

Diroknîvisên wê demê dibêjin, ko Bakunîn ew nama ji kifta di lê xwe de nîvisand û wî bi rastî bîrû bawerîya xwe guhartibû û şasbûnên xwe dinasîn.

Marks ji va nama dilovani bawernekir û guhneda xasteka hevaliyê. Hevalbendê Bakunîn bi zimanekî tûj êrişî Marks û "hişkûn û sertiya" wî kirin.

Lê bi rastî tevî nama ji dil mafê Marks hebû, bi asanî ji wî bawerneke. Piştî çar sal karê serbixwe û ji Navnetewiyê dûr ew vedigere cîhana karkeran. Marks nikantibû ji wî bawertbike, nemaze ji ber ko berê jî soz da bibe endam û soz jitîrkir.

Piştî, ko komîta Navnetewiyê xasteka Komela Sosyal-dêmokratiya Navnetewî qebûlnekir, wê nîşanda, ko amadeye xwe helke û liqên xwe bike yên Navnetewiyê, lê tenê bernameya xwe ya ramani bîhêle. Komîta giştî amadebûna xwe eşkerekir, wan liqan bike yên Navnetewiyê, eger ew bîrûbawerîyê wê qebûlkin. Bi kurtî em dixazin bêjin, ew komela nehate helkirin û duben diya xwe bi navnetewiyê re berdewamkir.

Ramanîn Bakunîn û dîtina wî bo avakirna sosyalistîyê

Dubendiya navbera Marks û Bakunîn ne li ser armanca xebatê, lê li ser şêwe û çareyên xebatê bû.

Bi bîrûbawerîya Bakunîn hebûna xwendekar, ronakbir û prolêtarîya şerpeze bi pêşengîya komek şoresger bese, ko karkeren rewşijwar û jîyatal jî rabin. Wî digot, pêwîste ev cîva ka burjiwazî bête hilweşandin û paşê her tişt wê bixwe têkeve sosyalistîyê.

Li gor vê dîtinê wî xebata siyasi di çarcoyê civaka burjiwazî de qebûlnedikir û xebata prolêtarya bo standina serdarîya siyasi çewt û şas didit. Li gor kar û barê Bakunîn û dîtina wî ji çareyên xebatê re navê anarşistîyê (fewdewîyê) lêbû.

Bakunîn di warê çûn û hatin û kar û bar de miroveki gelek jêhatî bû û her demê amadebû di karêş şoresgerî de besdarbe, lê di warê abori û ramani de ne ewqas li pêşbû û bi carekê ne tayê Marks bû.

Dûmayîk di hejmara... 15 de

=====
=====

Abdullah Peşêw helbestvaneki nîştimanperwre ji Kurdistana İraqê. Bi dilşewatî û hunermendkiyeke zor hêja dinivîse. Teví Abdullah Peşêw li Kurdistana İraq bi nav û denge, lê mexabin hên li nav Kurdistana Sûryê û Tirkîyê nenase, ji ber Peşêw bi zaravaya soranî dinivîse.

Serkewtin

Serdekewîn

Şûnke diwînê,

Tope qurêkî deskirdim.

Daye dest minalêkî kurd

Ew lebatî bûkeşûşe

Tivengêkî biçkolaney lê drût kird.

=====

Topê qurêk: mistek herf

Lebatî bûkeşûşe:li şûnê bûkê lîskê.

Gend wane ji şoresga Kuba.

(Dûmayîka hej. 13)

Di welgerandina 10 adarê de danûstandina min bi partîya komünîst re xurtbû, lê welgerandinê rewşike nuh peydakir.

Di destpêkê de min xelk amadekir ji bo xebateka yekbûyî ji hemû hêzan li dijf Patîsta. Ez berve Stratijîya leşkerî çûm. Min digot, em nikanin Patîsta biroxñin, eger em nebin yek. Li navbera hêzên li dijf hukumetê gotin jî çêbûn li ser xebata leşkerî û min dest bi tevgerê kir, lê tevgereke tenayî.

Di nav endamên Ersozoks de û hêdî hêdî komkên şoresgerî hatin meydanê. Bi vî şêweyî me destpêkir, lê pistî salekê diyarbû, ko şoreşke rastî nebû û evne leyланbûn (reyalbûn) û parti-yêñ li dijf hukumetê nikanibûn bingeha xebata şoresgerî danîna û hîn bi ser de gel jî xapandin. Hina ji wan nikanî û hineka jî nedixast.

Pistî diyarbûna vê rastiyê ez gihîştim birûbawerîyeke nuh, ya dibêje ko pêwîste em dest bi xebata leşkeri bikin, bi hêzên xwe yêñ tenhayî (serbixwe). Me plana Monkada danî. Me pir caran naweroka wê diyarkirîye û niha jî ezê bi kurtî bêjim: Gereke em leşkergehan bi dest xwe va bînin û gundiyan biliví-nin û bangkin bo xwepêşandaneke giştî û sûd bigrin ji neyar-tîya gel ji diktatoriyê re, û eger me nikanî bajaran bistînin emê herin navçeya Siêra Maystra.

Bi vî awayî me xwe amadekir bo standina Monkada û me baş diza-nî paşê emê çibkin. Bi dirêjîya vê katê giştî danûstandinê min bi komünîstan re hebûn. Duruşmân wan yêñ cuda hebûn. Me ji wan nexast, ko bawerîya xwe bi planêñ me bînin, ji ber ev kareki dijware ji partîyeke bi ruhiyeke kevnesopî (klasîkî) hatîye perwerdekirin (xudankirin), û ji wê bêtir ew bû, ko komünîstan standina serdarîya dewletê nikanîn ji xwe re bikin armanc, teví ko li Kuba rê hebû. Komünîstan nikanîn bi vî karî rabin, ji ber ko Amérîka bi temamî welatê me xistibû bin destêñ xwe.

Ev bûn birûbawerîyêñ me û jîyanê rastîya wan işbatkir. Me bi xurtî di nav partîya Ersozoks de karkir, û endamên wê bûn bin geheke xurt ji tevgerê re.

Jîyanê hîn tiştîkî din işbatkir, ko mera kane bi rêya gel, çek û bernama şoresgerî serdarîyê bi dest xwe xe û di rêya sosyalîstîyê de biçe.

Pirs: Piştî serketina şoreşê li Kuba partîyên burjiwazî ji sehna siyasi windabûn. Aya fermanin hebûn, ko ewna qedexekirin?

Bersiv: Na.

Pirs: Lê çawa neman? Ma ne piştî du mehan ew ji ser hev çûn, û bêguman ez li ser partîyên piştgirîya Patîsta kirin dengnakin. Ev pirsa eßkereye.

Bersiv: Di wê katê de diyarneyeka (rûdayeka) fodil hate mey danê, ji ber serokên hemû partîyan, yên li dijî Patîsta rawestibûn, pêwendiyêz zor baş bi me re dikirin û Prîo, Aureliano û yên din ji dostêne me yên mezin bûn.

Pirs: Ma ew hemû yekser piştî serketina şoreşê vege riyan Kuba?

Bersiv: Belê, û ewna bextewarbûn, şadibûn û beramberî me zor başbûn. Lê me bitirs li wan dinêri û me dida û distand û ji bo em bêtir pêwendîya diyarkin ezê vê nimûneyê bêjim: Me qanûnek li dijî dizêne malê dewletê derxist û karpêkirîya wê di 10 adarê de destpêkir. Eger heya 10 adarê rast me bi karbaniya, pêwîstbû me hebûna Prîo û ya serokên din jî dest bida ser (misaderekira), ji ber me baş dizanî, wan pere ji xezîna dewletê dizibûn, gava serok bûn. Me ew biryara wergirt ji ber ew li dijî Patîsta rabûn. Em zor bi wan re nerm bûn ji bo daxaziya yekbûnê.

Serokên burjiwazîye bixwe ji me bidûrketicin, dema gavêş şo-reşgerî bêtir bûn. Piştî serketina şoreşê me distûr amadekir û pêwîstbû hilbijartin jî bihatana çêkirin. Piştî şoreşê bi sê-çar mehan min pirsa hilbijartinan di gctineka xwe de li civîneka mezin diyarkir, lê li min vege randin, pêwîst niye bi hilbijartinan û gel jî bixwe biryar wergirtîye, li ser nebûna hilbijartinan.

Dema partîyên burjiwazî ev yekîtîya me û gel didîtin, dema gavêş şoreşgerî bêtir kûrdibûn wê demê wan hêviya xwe birîn û piranîyê wan ketin nav rêzên dijminan û eßkere li di jî şoreşê rawestîn û ji welêt barkirin, û ti biryarêñ taybetî bo nemana wan derneçûn.

Pirs: Bi ci şêwayîf rêxistina şoreşgera yekbûyî pêkhat?

Bersiv: Di roja yekem de piştî şoreşê rewşa welêt ne durust-bû, lê pêwendiyên xurt li gel serokên Partiya Sosyalista Gelêri hebûn, heya heval Blas Rok, sêkrêtêrê giştî, pêşneyar-kir, ko ez bibim serokê partiya wan.

Seroketiya me çêbûbû ji "Tevgera 26 temûzê" û ji "Partiya Sosyalistiya Gelêri". Serokên wê ji serokên şoreşê bûn wek Rawol Castro, Ernesto Tçê Gîvara û yên din.

Me hevalan hevdû didit her katekê û em li hevdû nedîheyrin û bîrûbawerîya me yekbû li ser pirsên bingehî. Yekbûn li ser vê bingehê pêkhat û seroketiya hilbijartî bi navê: "Serokatiya Şoreşgerî" yan "Yekitiya Rêxistinê Şoreşgerî" hate nîşandan.

Vê seroketiyê baş karkir, û hên berî yekîtiyê û di wê katê de leşkera gelêri jî pêkhat û xebateke baş ji bo paqikirna sêndikatan (nîqaban) ji mirovên paşverû çêbû, çeprewiyan û rasrewiyan serên xwe di nav tevgerê de rakirin.

Pirs: Ma Partiya Sosyalista Gelêri biryar da bo helkirna xwe bona pêkanîna yekftiya rêxistinê şoreşgerî?

Bersiv: Belê biryar da.

Pirs: Lî "Tevgera 26 temûzê" ci pêhat, ma biryareke taybetî bo wê hate standin?

Bersiv: Na. Bêgûman seroketiya wê jî hebû, lê piştî şoreşê newekhevî di gotinan de çêbû di navbera kesêni bi şoreşê re û yên li dijî wê. Hinekan ji wan derew û buhtan li ser komünistan belavdikirin û pêwendî tim xerabdikirin, û bi vî şêwayî serokatiya "Tevgerê" qelskirin.

Tevî "Tevger" heya wê demê di warê rêxistinî de hên şêweyî sazûmani nestandibû, ne kongre çêbûbû û ne jî bername û rî baz hebûn, lê tevî vê rewşê % 90 ji gel bi "Tevgerê" re bû. Lî wê ew lêmiştâ ji mirovan nikani xudîbikira.

Min tim digot, şoreş û bingeha şoreşê pir ji "Tevgerê" firehtirin. "Tevger" wek cobarekê (erçekê) bû, lê gel lêmiştâ Amazon bû, lêmiştâ şoreşê bi hev xist. Me baş dizanî dema Tevgerê temantûye, ji ber wê me kîntir bi navê wê

dengdikir û bêtir me bi navê şoreşê dengdikir.

Em kanin bipirsin, ma kî bi me re bû di zemanê xebata şoresgerî de? Ma em tenê nûnerên "Tevgera 26 temûzê" bûn? Me nûnertiya kî dikir?

Heya bi leşkerê Tevgerê re me digot, leşkerê şoresê yan leşkerê şoresger. Em ne bes nûnerên rêxistiniekê bû, me bi navê gel dengdikir û ji ber vê me bi yekîfîyê bangkir.

Dûmayîk di hejmara... 15 de

=====

Tora nûçeyan (şebeka exbaran)

- Dîwana helbestvanê kurdfî mezin Cîgerxwin ya 4 a bi navê "R O N A K" li Stokholm 1980 ji weşanên ROJA NU derket. Ronak 208 rûpelin û çapeke gelek hêja çapbûye. Bi rastî mera naxaze Ronak ji dest xwe deyne. Gelek spas bo Cîgerxwin helbestvanê gelê me. Weke hevalên ROJA NU nivîsandine em jî dibêjin: (Ev Dîwana 4'a ya Cîgerxwin, ku me li Swêd çapkîr, wê dengê gelê Kurdistanê di ruwê dijmin de bilintir bike.) ROJA NU.
- Di kongra 26 ya PKYS de Xalîd Muhyî Eddîn bi navê Partiya Kombûna Nîştimanîya Yekîtixaz li Misrê dengkir û bîrûbawerîya partiya xwe li ser rewşa Misrê û li dijî peymana Kamp Dêvid xastekên gelê Misrê bilindkirin. Bi navê Partiya Komunista Misrê jî endamê encûmana (mekteba) siyasi Mîşel Kamêl dengkir û rewşa Misrê û ya Rojhilata-Navîn diyarkir û bêtir êrişên împêryalist û rêjîmên paşverû li navçeya me şermûzarkirin. Mîşel Kamêl rola partiya komunista Misrê ya pêşengî di hemû rûdayêن (mezahêr) şerê çînfî li Misrê eıkerekir, tevî ko ew partîyeke hîn tezeye
- Çend hejmar li ser hatina İraqê ji pêtrolê: sala 1970 368 milyon dinar, piştî bihabûna sala 1973, di sala 1974 de gihişte 2040 milyon dinar. Sala 1978 15 milyar dollar, 1979 20 û 1980 bêtirî 35 milyar dollar.
- Dewletên împêryalist û nemaze împêryalistîya amêrikî peymaneke hîn bê nav li Rojhilata-Nêzîk û Navîn pêkanîne, ji Mexrîb heya Pakistan, Saûdiya Erebî rola xeznedar stan diye. Girani û girîngîyeke mezin dane Pakistanê, lê tevgera gelêrî, li gor nûçeyen rojnaman, li dijî rêjîma Ziya Ul Haq zor firehbûye, û komîn welatparêz têde beşdarin.